şopdara rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 591 21-Nîsan- 2019 Rojnameya Siyasî û Çandî

Çarşema Sor... Roja afirandina cîhanê ye

"Çarşem rojeke fadil e ku Melik Fexredîn ji eşiq û dil afrandiye û rihet û xeflet nas nekir, Çarşem rojeke bê hesab e, ji ber berisva wê ji ba milyaketan hatiye. Her wiha roja ku dêriyê xêra ji rojhilat heta rojava vedibe ye. "
Ev tişt di rêûrismên ola Êzidî de li ser roja Çareşema Sor hatine gotin, bi lavakirina Xwedê û spasiya Melek Tawûs temam dibe. Tevî cudabûna rêûrismên olan lê navaroka hemûyan yek e, ew e ku hemû banga baweriya yekxweda dikin ku xaliqê vê erdê ye.
Ji ber ku gelê Êzidî çanda xwe ya olî di encama êrîşên ku rastî hatine de winda kirin, agahiyên xwe ji qisekarên olî digirin. Di axaftina `Afirandina duyayê de` ev tişt hatiye gotin:
Xwedawendê me Înê kir esas e, Roja Şemî berê kiras e, Çarşem kir xilas e. Roja çarşema yekemîn ji meha Nîsanê li gorî roznameya rojhilat ji bo gelê Êzidî cejn e û bi navê Çarşema Sor tê naskirin yan jî seresala Êzidî. Bi rasthatina biharê re û pişkivandina gul û kulîlkên rengîn bi taybet gulanîsanê (xecxecog) cejn tê pîrozkirin. Li gorî oldaran cejnê navê xwe ji rengê gulê xacxacogan ê sor girtiye.
Hindek din jî dibêjin Êzdiyan di dirêjahiya serdema imperetoyan de gelek xwîn rijandine. Li gorî mîtelojiya Êzidî, dinya tarî û mij bû. Rûyê erd bi tebeqeyek qeşayê hatibû girtin. Xwedê, Tawûsê Melek roja çarşemê şand erdê da ku erdê geş bike û jiyanê vejîn bike. Carê yekê Tawûsê Melek ji asîman dadikeve Laleşê-semtê hecê Êzidiyan. Laleş dikeve herêma Şêxan a li başûrê Kurdistanê. Tebeqeya qeşeyê bi bandora tavê helî, rûyê erdê yê rastîn xuya bû, erd bi gelek cureyên gul û kulîlkên kesk, sor û zer geş bû. Ji ber wê wek destpêka biharê tê hesibandin û navê sersala Êzidî lê kirin.
Li gorî oldaran" Heta sala 612`an beriya zayînê Kurd vê rojê wek cejnek olî pîroz dikirin. Piştî ku gelê Kurd li ser xaka Kurdistanê li dijî hovantirîn imperetoriyên wê demê sekinîn û azadî bi destxistin êdî ev cejn veguherî cejnek neteweyî û olî, mînaka vê yekê di vê rojê de êrîşên împratoriyan li ser herêma Medyaya Kurdî pêk hat. Li ser vê yekê Şêx Adî kurê Misafir Hekarî yê ku wek lêvegerek olî ji Êzidiyan re tê hesibandin û gora wî li Laleşê ye, ev tişt pejirand û ev rism vê tiştî isbat dike:
Çarşema serî Nîsanê
Şêx Adî , şêx Şems xweste dîwanê
Xwedê berê xwe dide Êzdîxanê
Ewe cejna Kurdistanê
Bi hatine cejnê re gelê Êzidî amadekariyên xwe dikin. Di vê rojê de ayînên olî yên taybet pêk tên. Êzidî berbanga sibê zû şiyar dibin û cilên xwe yên herî xweşik li xwe dikin. Her wiha her yek li gorî karîna xwe qurban mîna mih, karik, çêl hwd serjê dikin û deriyê malên xwe bi gul û xecxecogan dixemilînin. Jin jî xwarinê amade dikin, ciwan jî 12 hêkên kelandî, her sê hêkan bi rengekî ji rengên werzên salê boyax dikin û wan datînin navenda malê. Hêk nîşaneya giloverbûna erdê ye. Gelê Êzidî beriya zanyarê Îtalî yê navdar Galileo bi hezaran salan zanîn ku erd gilover e. Kelandina hêkê tê wateya cemidandina erdê. Tebqeya hêkê yê derve piştî kelandinê nîşaneya helandina tebqeya qeşayê ye li ser rûyê erdê. Boyaxkirine hêkan sembola gul û kûlîlkan e yên ku bi hatina Tawûsê Melek re vebûne, yanî bihar û bihar jî destpêka jiyanê ye.
Gelê Êzidî roja Sêşemê serdana goran dikin û jin jî bi xwe re hêk, şêranî û fêkî dibin. Ii goristanê di nav hev du de û li xizanan belav dikin.

NÎSAN BÛKA SALÊ; DI SER XWE RE BÛK NÎNE

Gelek kevneşopiyên vê cejnê hene, zevî nayê ajotin, ji ber ku piraniya gul, şînatî û kulîlkan di vê mehê de dipişkivin. Her wiha zewac jî heya derbasbûna vê mehê têne taloqkirin. Tê bawerkirin ku bi anîna bûkê re di vê mehê de dê kerastê bîne serê xwediyên malê. Li gorî baweriyan meha Nîsanê bi xwe bûk e, ji ber wê navê bûka salê bi nav kirin (nîsan bûka salê; di ser xwe re bûk nîne).

ÊZIDIYÊN ROJAVA Û ÇARŞMA SOR

Êzidî li Rojava li her du kantonên Cizîr, Efrînê û taxa Şêxmeqsûd a Helebê hene. Bi gelê Kurd û Suryan re li herêmên xwe şahiyên gelêrî lidardixistin. Di wan şahiyan de stran, dîlana gelêrî ji çanda Kurd û barnameyên çandî û şanoyên girêdayî ola Êzidî dihatin pêşandan.
Êzidiyên Rojava hemû rêûrismên cejnê pêk tînin, ji bilî yên ku li Laleşê navenda rohanî ya Êzidiyan pêk tên. Bi destpêkirina şoreşa Rojava re, li tevahiya kantonên Rojava roja cejna Çarşemê Sor wek batlaneya fermî li tevahiya saziyên fermî hate ragihandin tevî lidarxistina şahiyan û vejandina çanda cejnê.
Hevseroka Mala Êzidî ya bajarê Helebê Gulê Xezalê girêdayî mijarê wiha got: "Berê hejmara malbatên Êzidî zêdetirî hezar bû û li hindek deveran mîna Şêxmeqsûd, Biêdîn, Hiluk, Bistan Paşa, Eşrefiyê û Siryan belav bibûn. Hemû ayînên ola xwe li Heleb an jî Efrînê bi hemû olan re pîroz dikirin."
Gulê destnîşan kir ku piştî ku çeteyên dagirkeriya Tirk dest denîn ser taxên rojhilatê bajarê Helebê tevahiya tiştên wan ên pîroz hatine talankirin.
Bi destpêkirina êrîşên artêşa Tirk a dagirker li ser Efrînê gundên Êzidî yekser hatin hedefgirtin. Di encamê de hejmarek ji şêniyan şehîd û birîndar bûn. Ji ber tirsa dubarekirina komkujî û fermanan li ser xwe Êzidiyên Efrînê neçar man ji Efrînê ber bi Şehbayê ve derkevin. Çeteyên dagirkeriya Tirk mazarên olî di nav de ya herî kevnar Parse Xatûn li gundê Qestel Cindo wêran kirin.
Hindek dîmenên ku li ser tevna hatibûn belav kirin asta hovîtiya çeteyan li hemberî gelê Êzidî xuya kirin. Her wiha Êzidiyên ku li Efrînê mane bi darê zorê dikin misluman. Tevî talankirina tevahiya milkên Êzidiyan bi hinceta ku ji wan re helal in. Ji bilî wê jî çeteyên artêşa Tirk a dagirker peykera Zeredeşt ya ku li ber avahiya Navenda Komeleya Çandî ya Êzidî bû şikandin û navendê komeleyê şewitandin. Gulê Xezalê dibêje ruxmî kiryarên çeteyên artêşa Tirk a dagirker ew nikarin ola Êzidî û ayînên wê qir bikin.

ŞENGAL Û ÇARŞEMA SOR

Piştî fermana li ser Êzidiyên Şengalê ji hêla çeteyên DAIŞ`ê ve kuştin, revandin û destavêtina jinan hate kirin, lê gelê Êzidî berxwedana li dijî wan çeteyan hilbijartin û bi alîkariya gerîlayên çiyayên Qendîl karîn Şengal ji nû ve vegerînin. Niha Êzidî tevahiya rêûrismên ola xwe li Şengalê û Laleşê tevî ku DAIŞ`ê şûnwarên wan wêran kirine pêk tînin.
Îsal li taxa Şêxmeqsûd a Helebê û herêma Cizîrê gelê Êzidî bi tevlîbûna tevahiya pêkhate û olan cejna Çarşema Sor pîroz dikin. ....*ANHA*

Li Başûrê Fransayê kampa jinan

Endamên meclîs û komuna jinên Kurd ên li Başûrê Fransasyê li kampa bi navê ''Di felsefeya azadiyê de jinên Kurd ên rêxistinî'' hatin cem hev. Jinan gotin kamp ne tenê ji bo perwerdehiyê her wiha derbarê jiyana komun jî modêlek e. Zarokên ku tevlî kampên bûn, hem ji xwe re lîstin û hem jî hîn bûn. Li Başûrê Fransayê jin her sal biharî diçine kampê.*R-2*

şopdara rastiyê ye
Ronahî
/www.ronahi.net/ku Hejmar : 591 21-Nîsan- 2019 Rojnameya Siyasî û Çandî

MACRON TEQEZÎ LI SER DESTEKDAYÎNA RÊVEBERIYA XWESER KIR

Şandeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku serdana Fransayê dike, der barê hevdîtina wan a bi serokê Fransayê Emmanuel Macron a li Parîsê, civîneke çapemeniyê li dar xist. hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser destnîşan kir ku serokê Fransayê Macron teqezî li ser destekdayîna Rêveberiya Xweser kir.

SERKETINA DAWÎ LI HEMBERÎ DAIŞ'Ê BI DEMDIRÊJIYE

El-Mehbaş got ragihandina têkçûna DAIŞ`ê û serketina dîrokî ku di 23`yê Adarê de pêk hat, ne tê wateya tunekirina terorê, serketina dawî pêwîstiya xwe bi demeke dirêj û karekî bêhtir heye û wiha got: "Ji ber vê yekê jî pêwîstî bi koordîneyeke zêde bi Koalîsyona Navneteweyî re heye. Her wiha divê nûnerên Rêveberiya Xweser beşdarî çêkirina destûra Sûriyê bibin. Ji ber ku Rêveberiya Xweser nûnertiya zêdetirî 5 milyon kes ji hemû pêkhateyên Sûriyê dike."

XETERIYA ÇETEYÊN DAIŞ LI SER TEVAHIYA CÎHANÊ

Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebd Hamid El-Mehbaş got: "Bi dehan şaneyên veşartî yên terorîst, her wiha bi hezaran endamên çeteyên DAIŞ û tevî malbatên wan li herêmên Rêveberiya Xweser hene. Hebûna mezin a vê hejmarê li herêmê û gefên dewleta cîran a Tirkiyê, xetereyê çêdikin. Ji ber ku ger êrîş li dijî herêmên me çêbe, wê ew kesên ku xetere li ser me û tevahiya cîhanê çêdikin ji zindanê birevin." *R-2*

YPJ'ê du dewreyên şervanên nû bi dawî kir

YPJ li akademiya Şehîd Bêrîvan 2 dewreyên nû ku ji şervanên Kurd û Ereb pêk dihat bi merasîmeke leşkerî bi dawî kir. Ji fermandarên YPJ'ê Rûken Efrîn jî beşdarî merasîmê bû û ji şervanan re axivî . her wiha şervanan jî nerînên xwe anîn ziman û got: piştî em tevlî nava refên YPJ'ê bûn me nas kir ku rêya azadkirina jinê bi felsefeya Rêber APO re dibe. Şervanan di dawiya merasimê de soza xwe dan. *R-3*

Yekîtiya Bazirganiyê ya Skoç piştgirî da grevên birçîbûnê

Piştgiriya ji bo berxwedêrên greva birçîbûnê li qada navneteweyî didome. Di Kongreya Sendîkayên Skoç de hate xwestin, tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi dawî bibe û piştgirî ji berxwedêrên greva birçîbûnê re hate dayin. Aktîvîstên Skoç her wiha bi Serokê TUC ê re têkilî danîn ku tevna piştgiriyê xurt bikin û ji mirovan xwestin ku li ser mijarê nameyan ji CPT re binivîsînin *R-2*

Li Hewîceyê 6 çeteyên DAIŞ'ê hatin kuştin

Hêzên antîterorê yên Iraqê bi alîkariya hêzên koalîsyonê êrîşî baregehên çeteyên DAIŞ'ê yên li çiyayê navçeya Hewîceyê kir. Di encama êrîşê de 6 hate kuştin û gelek çek û cebilxane hatin bidestxistin. Çavkaniyeke taybet diyar kir ku di heman demê de gelek cihên ku çeteyan xwe tê de vedişartin jî hatine têkbirin. *R-2*

Gelo dê senaryoya Efrînê li Til Rifatê dubare bibe?

Gelek gotegotên girêdayî rewşa navçeya Til Rifatê, lihevkirina Rûsî-Tirkiyê ku dê senaryoya Efrînê lê were dubarekirin belav bûne. Ji aliyekî din ve metirsiyên êrîşek leşkerî li Til Rifatê zêde dibin. Di rewşek wisan de dê karesatek mirovî rû bide û 25 hezar sivîl koçber bibin. Hevserokê Meclisa navçeya Til Rifatê Mihemed Henan teqez kir ku ew hewl didin pêdiviyên şêniyan li gel şert û mercên dijwar ên dorpêçê peyda bikin. *R-5*

Şêniyên Efrînê: Planên Tirkiyê wê neghêjin serî

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê binpêkirinên xwe yên li dijî gundên navçeya Şêrawayê didomînin. Tirsê di nava şêniyan de belav dike û dagirkeriya xwe ferz dike. Ji ber vê yekê car caran gundan topbaran dikin û dîwaran di navbera gundên kantonê de lêdike. Şêniyên navçeya Şêrawa ya Efrînê gotin, planên Tirkiyê û çeteyên wê yên li ser herêmê dê têk biçin. *R-2*

'Divê rêjîm li hemberî Tirkiye helwesta xwe diyar bike'

Berpirsê Komîteya Têkiliyên Doplomasî yê herêma Efrînê Mihemed Hesen pêvajoya piştî têkçûna DAIŞ'ê, berdewama zêdegaviyên Tirkiyê li Sûriyê û pêvajoya pêşeroja Sûriyê nirxand. Mihemed Hesen diyar kir ku dagirkeriya Tirkiyê dîwaran li Efrînê lêdike da ku tevlî axa Tirkiyê bike. Mihemed Hesen ji rêjîma Sûriyê xwest ku helwestê nîşanî binpêkirinên Tirkiyê bike. *R-4*

DAIŞ li Afrîkiyayê çalak dibe

Çeteyên DAIŞ`ê di rojnameyeke xwe de ragihandin ku wan di hefteyekê de 69 leşkerên artêşa Nîjîriya û hêzên Afrîkî yên têkoşîna li dijî terorê kuştin û birîndar kirin, her wiha di yekemîn êrîşa li dijî Komara Demokratîk a Kongoyê de 3 kes kuştin. *R-2*

Li Girê Spî pêşbirka xwendekaran

Rêveberiya dibistanên bajarê Girê Spî pêşbirka "Serkêşên Zanistê" li dar xist. Pêşbirk li ser bingeha derbaskirina hejmarek ji xwendekarên serkeftî ji hemû dibistanan ji testekê re tê birêvebirin da ku karînên xwendekaran bi pêş ve bibin, asta çandî bilind bikin û rihê xebata kollektîf di nav xwendekar û dibistanan de ava bikin. Xwendekarên ku beşdarî pêşbirkê bûne, derbasî testên çandî û zanistî bûn ku ji madeyên qonaxên xwendinê, agahiyên giştî û mijarên hunerî wekî wênesazî, nivîs û endezyarî pêk tên.
Li ser vî esasî Komîteya Perwerde û Fêrkirinê li Girê Spî xwendekarên serketî ji dibistanên bajêr ên qonaxa seretayî hildibijêre û testên girêdayî madeya ku xwendekar tê de serkeftî ne, çêdikin. Madeyên ku xwendekar der barê wan de testan derbas dikin, ev in; zimanên erebî û kurdî, nivîs bi hemû cureyên xwe, wênesazî, matematîk û rewanbêjî.
Têkildarî mijarê serpereştê rêvebirina dibistanan Mihemed Mehmûd Xelef wiha got: "Pêşbirka serkêşan niha tenê girêdayî dibistanên navçeya Girê Spî ye û serkêşên ku beşdarî pêşbirkê bûne, ji xwendekarên refa 5`an in û dê testên di madeya matematîkê derbas bikin. Her wiha xwendekarên refa 4`an dê testên ziman derbas bikin."
Xelef wiha li axaftina xwe zêde kir: "Testên ku tên çêkirin ji her du xwendekarên ji şêniyên Ereb û Kurd re ne, her yek ji van xwendekaran li gorî zimanê xwe yê dayikê derbasî testan dibe."
Tê payîn ku li navçeyên din ên kantona Girê Spî pêşbirkên wiha piştî ragihandina serencamên serkêşên heyî li navenda navçeyê werin pêkanîn. Her wiha piştî sererastkirina pelên pirsan ên testan, dê serencamên dawîn ji pêşbirkê re werin ragihandin

Yekîtiya Bazirganiyê ya Skoç piştgirî da grevên birçîbûnê

Piştgiriya ji bo berxwedêrên greva birçîbûnê li qada navneteweyî didome. Di Kongreya Sendîkayên Skoç de hate xwestin, tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi dawî bibe û piştgirî ji berxwedêrên greva birçîbûnê re hate dayin. Aktîvîstên Skoç her wiha bi Serokê TUC ê re têkilî danîn ku tevna piştgiriyê xurt bikin û ji mirovan xwestin ku li ser mijarê nameyan ji CPT re binivîsînin

Konseya Bazirganiyê ya Aberdeenê ji STUC'ê xwest ku nêrîna xwe ji Konseya Ewropayê, Komîteya Pêşgirtina li Êşkenceyê ya Ewropayê û Wezareta Karên Derve ya Îngilîstanê re ragihîne. Her wiha li ser grevên birçîbûnê agahiyê bide sendîkavanan û piştgiriyê bide çalakiyên piştevaniyê.

Aktîvîstên Skoç her wiha bi Serokê TUC ê Gallerê Shavanah Taj re têkilî danîn ku tevna piştgiriyê xurt bikin. Aktîvîstên Skoç li ser asta heyî ya çalakiyên greva birçîbûnê agahî dan û ji mirovan xwestin ku li ser mijarê nameyan ji CPT re binivîsînin.

DAIŞ li Afrîkiyayê çalak dibe

Ajansa Ruetersê got çeteyên DAIŞ`ê di rojnameyeke xwe de ragihandin ku wan di hefteyekê de 69 leşkerên artêşa Nîjîriya û hêzên Afrîkî yên têkoşîna li dijî terorê kuştin û birîndar kirin.

Her wiha ajansê destnîşan kir ku êrîş li dijî navendeke leşkerî û bajarokek li wîlayeta Borno li bakur rojhilatê Nîjîriya û herêma gola Chad hate kirin.

Li gorî Reutersê, çeteyên"Wîlayeta Xerbî Afrîka" ku ji koma Boko Heram veqetiyan û ji sala 2016`an li Nîjîriya bicih bûne, ragihandin ku wan li nêzî bajarokê Tomîr tangekeke koalisyona Afrîkî rûxandin û hemû leşkerên di tangê de kuştin.

He wiha DAIŞ`ê di êrîşa li ser Komara Demokratîk a Kongoyê girt ser xwe. Di êrîşê de, 2 leşker û sivîlek hatin kuştin.

Li Hewîceyê 6 çeteyên DAIŞ'ê hatin kuştin

Hêzên antîterorê yên Iraqê bi alîkariya hêzên koalîsyonê li navçeya Hewîceyê ya ser bi Kerkûkê ve, operasyonek li dijî çeteyên DAIŞ'ê li dar xist. Çavkaniyeke taybet a ji hêzên ewlekariyê ku nexwest navê xwe bide, ji RojNewsê re axivî û got: "Îro danê sibehê, hêzên antîterorê yên Iraqê bi alîkariya hêzên koalîsyonê operasyoneke taybet li çiyayê navçeya Hewîce li hemberî çeteyên DAIŞ'ê li dar xist. Di encama êrîşê de 6 çeteyên DAIŞ hatin kuştin. Hêzên me 2 erebe û gelek çek û cebilxane jî bi dest xistin. Her wiha gelek cihên ku çeteyan xwe tê de vedişartin jî hatin têkbirin."

Heman çavkaniyê da zanîn ku di encama êrîşê de 2 endamên hêzên antîterorê yên Iraqê mirine û 3 jî birîndar bûne.

Şêniyên Efrînê: Planên Tirkiyê wê neghêjin serî

Şêniyên navçeya Şêrawa ya Efrînê gotin, planên Tirkiyê û çeteyên wê yên li ser herêmê dê têk biçin. Şêniyan bang li rejîma Sûriyeyê kirin ku erka xwe pêk bînin û li hemberî van binpêkirinan helwest nîşan bide.

Girêdayî mijarê şêniyê bi navê Xelîl Xelo ye ji gundê Soxanekê wiha got: "Dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê car caran top û roketan li gundê me direşîne. Em neçar dimînin xwe û zarokên di şikeftan de biparêzin. Tirkiyê wisa dike da ku tirsê belav bike

û di dawiyê de dagirkirina gund hesan bike."

Xelo bang li rejîma Sûriyê kir ku helwestê nîşanî Tirkiyê bike. Welatiya bi navê Almasa Ehemed ji navçeya Şerayê ye û li gundê Bînê yê Şêrawayê dimîne. Almasa diyar kir ku êrîşên dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê vîna gelê Efrînê neşkîne. Almasa got, Efrîn bi îradeya zarên wan dê bi ser bikeve.

Şêniyê bi navê Receb Mustefa yê ji gundê Aqîba jî got, Tirkiye û çeteyên dixwazin bi lêkirina dîwarê çemento kantonên Efrînê û Şehbayê ji hev qut bike. Her wiha destnîşan kir ku topbaranên li ser Şêrawayê wê vîna wan neşkîne. Mustefa diyar kir ku dê planên dagirkeran li ser herêmê neghêjin serî....

.ANHA

Macron teqezî li ser destekdayîna Rêveberiya Xweser kir

Di civînê de hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebd Hamid El-Mehbaş destnîşan kir ku herêm ji mezintirîn rêxistina terorîst hate rizgarkirin û berdêlên giran ji bo rizgarkirina herêmê hatin dayîn û wiha dewam kir: "Me 11 hezar şehîd û zêdetirî 22 hezar birîndar dan. Koalîsyona Navdewletî jî şirîkê vê serkefinê ye."

El-Mehbaş got ragihandina têkçûna DAIŞ`ê û serkeftina dîrokî ku di 23`yê Adarê de pêk hat, ne tê wateya tunekirina terorê, serkeftina dawî pêwîstiya xwe bi demeke dirêj û karekî bêhtir heye û wiha got: "Ji ber vê yekê jî pêwîstî bi koordîneyeke zêde bi Koalîsyona Navneteweyî re heye."

El-Mehbaş bi berdewamî got: "Li ser vî esasî em ji civaka navneteweyî daxwaz dikin ku destekê ji bo avakirina dadgeheke sûcdaran a navneteweyî li herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bidin, da ku ev çete li gorî qanûnan û hevpeymanên navneteweyî werin darizandin."

Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebd Hamid El-Mehbaş bal kişand ser hevdîtina wan a bi serokê Fransayê re û got: "Serokê Fransayê teqezî li ser destekdayîna Rêveberiya Xweser kir da ku nûnerên wan di çêkirina destûra Sûriyê de hebin. Her wiha serokê Fransayê, teqezî li ser çareserkirina aloziya Sûriyê li gorî biryara navneteweyî ya 2254'an kir."

Her wiha El-Mehbaş da zanîn ku serokê Fransayê teqezî li ser destekdayîna Rêveberiya xwe di aliyê madî de kir, da ku xebatên geşkirin û xizmetguzariyê werin kirin. El-Mehbaş anî ziman ku serokê Fransayê dê destekê bide ji bo xebatên ewlehî û îstiqrara li herêmê.

Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di dawiya axaftina xwe de got serokê Fransayê bal kişand ser girîngiya ewlehiya herêmên li ser sînor û got: "Em wek Rêveberiya Xweser jî, ev yek daxwaza me ya sereke ye, ji ber ku em dixwazin têkiliyeke xweş a cîrantiyê bi Tirkiyê re hebe."

Li Başûrê Fransayê kampa jinan

Jinên Meclîsên Jinan a Arîn Mîrkan, Komûna Jinan a Montpeîllerê, Komûna Jinan a Draguîgnaê, Komîsyona Jinan a Toulouse û Komûna Jinan a Bordeauxê yên ku li Marsîlya ya Fransayê xebatan dikin di navbeyna 11-14'ê Nîsanê de li St. Maxîmînê li kampê hatin cem hev.

Di roja pêşî ya kampê de li ser Jineolojiyê û dîroka Têkoşîna Azadiya Kurdan perwerdehî hate dîtin. Roja duyan atolyeyên bi mijara ''hevjiyana azad'', ''demokratîkkirina malbatê'' û ''zayendiya civakîparêz'' atolye hatin avakirin. Roja sêyan jî li ser Pergala Konfederal a Jinan Vîna Rêxistinî ya Jinan ya bi Meclîs û Komûnan gotebêjî hatin kirin.

Jinan gotin kamp ne tenê ji bo perwerdehiyê her wiha derbarê jiyana komun jî modêlek e. Zarokên ku tevlî kampên bûn, hem ji xwe re lîstin û hem jî hîn bûn. Li Başûrê Fransayê jin her sal biharî diçine kampê.

Mihrîcana duyemîn a zarokan hat lidarxistin

Duyemîn Mîhrîcana Zarokan a Çand û Hunerê bi tevlêbûna gelek komên stran, govend û şanoyê li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo hate lidarxistin. Rêvebera komîteya çalakiya yên dibistanên Qamişlo Hêvîn Mihemed diyar kir ku ji bo nifşên nû hunera kurdî pêşbixînin xebatên çalakiyan dewam dikin.

Dilîn EHMED

Li Navenda Mihemed Şêxo a Çand û Huner ya bajarê Qamişlo 14'ê nîsana 2019 mihrîcana duyemîn ya xwendekarên dibistanên Qamişlo hat lidarxistin. Bi tevlîbûna 19 komên çalakiyên çand û hunerê pêşandanên weke şano, helbest, govend, stran, werzîş û hwd..... di mihrîcan de hat pêşkêşkirin.

ZAROK PÊŞENGÊ CIVAKÊ NE

Rêvebera Komîta Çalakiyên dibistanên Qamişlo Hêvîn Mihemed axivî û diyar kir ku ji despêka vekirina dibistanan ew amadekariyên xwe ji bo mihrîcanê dikin û got; "Ermaca me ya sereke ew e ku di rêya zarokan de çand û hunera kurdî pêşbixînin, ji ber ku wek tê zanîn zarok pêşengê civakên ne. Ji ber civak bi çanda xwe tê naskirin û bi taybet gelê kurd bi ziman, exlaq û cil û bergên xwe yên kurdî têne naskirin, divê li dibistanan li ser biranşê çand û huner baş were seknandin. ji ber ku wê zarok çanda ku têde mezin dibin, biparêzin."

XWESTEKÊN FÊRBÛNA ÇANDA KURDÎ ZÊDE DIBE

Hêvîn di dewama axaftina xwe de, da zanîn ku sal bi sal mihrîcana zarokan pêşdikeve û got; "Festîvala îsal ji sala borî baştir bû ji ber ku zarokan hîn bêtir çanda xwe naskirin û li ser xebatên çandê têne perwerdekirin. Ya balkêş ew e ku dema em dest bi amadekariyên mihrîcanê dikin xwendekar bi coşeke mezin nêz dibin, em jî bi vê yekê gelekî kêfxweşdibin."

DI RIYA ZAROKAN DE ÇAND WÊ WERE PARASTIN

Rêvebera Komîta Çalakiyên dibistanên Qamişlo Hêvîn Mihemed di dawiya axaftina xwe de behsa projeyên xebatên çalakiyên çand û huner yên li dibistanan kir û got; "Ji bo pêşketina xebatên çand û huner perwerdeyên çalakiyan li dibistanan tên berdewam kirin lê ji bo em hîn bêtir karê xwe pêşbixînin pêwîstiya me bi kesên pispor heye ku perwedeyê li ser çand û hunerê bide. Ji ber ku ne her kes dikare di karê çand û hunerê de bixebite."

Rastiya edebiyat an jî wêjeyê (Beşe 3)Wêje û civat

Mîna hemû beşên hunerê, edebiyat jî di nav civakê de derdikeve holê û bi civakê re xwe dikemilîne. Di navbera civakê û edebiyatê de her dem têkiliyek dualî heye. Edebiyatvan ji nav civakê de derdikeve û berhemên xwe mîna konekî li ser sînga civakê ava dike. Berhemên edebiyatvan, ango edebiyat ruh dide civaka ku tê de dijî, hişê/bîra wê teze û zelal dike, tamîr û tedawî dike. Ji bona fêmkirin û lihevkirinê zemîn peyda dike, amade û sererast dike. Li gor hewceyên civakê pêşîya wan ronî dike, ji wan re dibe rêber. Edebiyat ziman û çanda wan berfîreh dike.

Dema mirov bala xwe dide nişêtên edebiyatê dibîne ku ew ji bona lêkirina bîra/hişê hevpar a gel pêwist e/zerûrî ye. Her ku berhemên edebî gor însan û vegotinên însan hatin pêşkeşkirin ew zindî û hewceyek e. Mirov çiqas zimanê xwe pêşve bibe weqas xwe pêşve dibe; çiqas xwe pêşve bibe weqas bîra xwe pêşve dibe û ev dîsa pêşvebirina ziman ji xwe re tîne. Ji ber ku mirov hebûnek civakî ye di bin bandora civakê de ye, kêm be jî bi kirinên xwe li ser civakê xwedî bandor e.

Gelê kurd bi salan zimanê xwe ên hat qedexe kirin, kêm hat dîtîn, biçûk hat xistin û pê henek hat kirin bi saya edebiyata devkî (dengbêj û çîrokbêjan) parast û bi wan hestên xwe derman kir. Ew hêza gotinên devkî ji birîn, hêrs, bêçaretî û tengasîyên wan re bûn merhem.

Edebiyat nebe, hêdî hêdî hestên civakê vedimire, mirovên di nav civakê de bê xem û bê hîs dibin, her yek ji alîyê xwe yê nebaş re dikeve bezê. Edebiyat qewil û qalên jiyanê ku mirov dorpêç kirine, dide aliyekî û eslê însan nîşanî mirov dide. Edebiyatvan deng li mirovahiyê dike û ji bona têkûziyên mirovahî berhemên xweşik û bedew pêşkêş dike. Tiştên ku neteweyekê li ser piyan dihêlin edebiyat û berhemên wê yên edebî ne. Ew jî bi zimanê wî gelî va zexm girêdayî ne. Lewma hemu dewletên dagirkerên nûjen êrîşên xwe yên ewil li dijî zimanên gelên bindest dikin. Kurdan bîrên/hişên xwe demek dirêj bi stran, kilam, çîrok û destanên dengbêjan zindî girtin.

Têkiliya desthiladariyê û wêjeya neteweyî

Evîn HESEN

Wêjeya neteweyî û desthiladarî, du têgehên ku di pêvajoya tevgerên neteweyî de ji hev cuda nabin û bêyî hev nayên fikirîn. Wêjeya neteweyî jî bi vê netewebûnê ve girêdayî ye û bi heman rengî ye. Wêjevan, ji nav rewşenbîr û nivîskarên ku di pêvajoya avakirina netew dewletan de cih girtine belkî yên herî girîng bin. Ji ber ku netewe li ser nasnameyên kolektîf ava dibin û wêjevan bi berhem û vegotinên xwe dibin perçeyek ji vê pêvajoyê. Mînak li ser têkiliya netewe û nirxên kolektîf, di têkiliya navbera wêje û serxwebûn de têkiliyeke wiha der tê:

"Armanca dawiya dawî ya neteweperweriyê avakirin û xurtkirna dewleteke serbixwe ye. Lê pêwîstî bi tevneke binirx û hestan heye ku dewletê li ser lingan bihêle. Ji bo avakirina millet, pêwîstî bi lihevrastkirina vegotinên kolektîf, wekhevkirina cudahiyên etnikî û li ser hemwelatiyan, dane qebûlkirina îdeolojiya pirrengî, heye."

Derbarê netewe û pêvajoya avabûna wê dike jî li ser heman bingehê ye, ji ber netewe civakeke siyasî ya xeyalkirî ye, bi şiklê ku hem desthiladariyê hem jî sînoran di xwe de dihewîne. Anku ji bo ku civatek kolektîf weke netewe pêk were, pêwîstî bi xeyalan heye ku ev xeyal divê xeyalên hevbeş bin û di serê endamên wê neteweyê de bi heman rengî cih bigrin. Wê demê dikare bê gotin ku wêje xwedî girîngiyeke ya wan xeyalan e ku neteweyê pêk tîne. Ji ber vê yekê di avakirina hişmendiya millet de wêje saziya herî girîng e.

Têgeha "Desthiladariyê" beramberî têgeha "Dewlet"ê tê ku ew jî pergalkirina encama wan tevgerên kolektîfkirinê ne. Helbet divê ew tevger bi ser bikevin. Dema qala tevgera neteweyî ya kurdan bê kirin ji ber ku welatê kurdan coxrafyayeke perçebûyî ye û zimanê wan pirdiyalektî ye, hem meseleya tevgera neteweperweriyê hem jî bi vê ve girêdayî meseleya wêjeya neteweyî ye, ji ber ku di her herêm û civatekê de xisûsiyet û taybetiyên dîrokî yên cuda hene, bûyerên cuda qewimîne û desthiladariyên cuda avabûne, gelekî giran dibe. Mînaka herî nêz, Cegerxwîn di hewldana pêvajoya avakirina nasnameyeke kolektîf û di nava dibistaneke neteweyî de cih girtiye ku ev dibistan ji kesên weke Pîremêrd, Goran, Bêkes, Dildar, Osman Sebrî, Qedrîcan û Hejar pêk dihat. Ji ber vê hewldana Cegerxwîn a gihîştina desthiladariya ye ku rengvedana têkiliyên desthiladariya di helbesta wî de zêde peyda bûne. Di avabûna wêjeya neteweyî ya kurdan de yek ji diyardeyên herî girîng perçebûna welatê wan e û netewe dewletên zordar ku nasnameya wan înkar kirin û bi pêvajoyên ku kurd bi hisên neteweperweriyê ne hisin dane meşandin. Abbas Walî ji bo rewşa Îranê vê yekê wiha rave dike, lê em baş serwextin ku vegotina wî ji hemû parçeyên Kurdistanê re jî derbasdar e:

"Desthiladariya serdest cudahiyên etnîk û zimanî ji xwe re kir ermanc û bi çewisandina van cudahiyan, zemîna ku civaka kurdan ya çandî-zimanî bibe civakeke etnîk-zimanî amade kir pê re pê re bû sedema vê dagerînê."

Di vê dagerîna ku Walî behs dike de helbet roleke girîng a wêjevanan lîstiye ku kesên weke Goran, Qedrîcan, Cegerxwîn û hwd. di vî warî de derketine pêş. Loma bi rêya wêjeyê xwestine ku kurd jî bibin xwedî desthiladarî, anku azad bibe xwedî desthiladarî û azadbûn jî bo wan dihat heman wateyê.

Ji ber vê yekê ya ku lêgerîna azadiya kurdan dike, şertên ku îro tê de ne; înkar û çewisandina nasnameya wan e. Azadî ji vê dijberiyê dizê û her dem bi desthiladariyê hatiye xemilandin. Cihê ku desthiladarî lê nebe daxwaza azadî jî nabe.

Wêje û tevgera Kurdistanî di qada navneteweyî de

Derwêş M. FERHO

Dema ez berhemek bi zimanekî din li ser Kurdan dibînim pirr şah dibim. Çi werger çi lêkolîn yan şîrove ferq nake. Ya giring xebateke bi wate ye. Ji bo navneteweyîkirina Kurd û Kurdistanê pêdiviyek mezin e. Sedema vê şahbûnê jî ew e ku hêdî hêdî ev valahiya li dervayê welêt tê dagirtin. Kurdistanî bi xwe êdî li ser xwe, jiyan, çand, wêje, dîrok, nasname û pirsgirêka xwe diaxivin.

Morgenlicht (Seher, Berbang), pirtûka hevserokê HDP SElahattin Demirtaş, ku ev çend sal e di girtîgehên Turkiyê de ye ji aliyê Hanneke van der Heijden ve hatiye wergerandin û Signatuur weşandiye. Mijarên pirtûkê jineke tesadufî xwe di nava xwepêşandanekê de dibîne û ji aliyê polîsê Turk tê girtin, keçeke ku bi tewanbarkirina pirsgirêka namûsê ji aliyê bavê xwe tê terkkirin, û keç û dêya xwe re bazdayî ye, … Selahattin Demirtaş, bi awayekî xurt, zimanekî zelal, şiroveyeke wêjeyî rewş û hestên civaka Turkiya îro bi hosteyî dinivîse. Dema meriv vê pirtûkê dixwîne, buyer û encamên wan di mêjiyê meriv de têne qeydkirin. Meriv dikşine nav jiyana wê civakê. Rastiya civakê, hestên xelkê, xemgînî û psîkolojiya wan, bi zimanekî rexnegir dinivîse.

Qehremanên di çîrokên berhemê de mîna neynika civaka îro li Turkiyê ne. Her kes xwe di wan de dibîne. Şahbûn û xemgînî di ber hev re, di jiyana merov de ji hev dûr nakevîn. Ev jî hêza vê berhemê ye ku îro li Hollanda û Beljîka giha ye xwendevanên xwe.

Dit vuur dooft nooit, een jaar bij de PKK (Ev agir qet natefê, salek bi PKK re), ji aliyê Fréderike Geerdink hatiye nivîsîn û Spectrum weşandiye.

Rojnamevana navdar Fréderike Geerdink di navbera 2006-2015 de xebata xwe li ser rewşa Turkiyê didomand. Dema dewleta Turkiyê 34 bêgunehên Kurd, pirraniya wan zarok, di 2012 de bombebaran kir û kuşt, lêkolîneke giranbiha pêkanî û bi nave De Jongens zijn dood (Ciwan mirin) da weşanê. Bi saya vê berhema rojnamegerî xelata Kees Brusse ya 2015 stend. Di sala 2015 de xebata wê kete çavê rayedarên Turkiyê û bi "propagandaya rêxistina terorîst" hate tewanbarkirin. Girtî ma, ji Turkiyê hate derkirin.

Sebra wê nehat. Li pey rastiyê geriya. Di salên 2016 û 2017 de çû nav herêmên rizgarkirî û li çiya bi şervanên Kurd, gerîlla re jiya. Jiyana wan, têkoşîna wan ji bo azadiyê, kultûrê, nasnamê ji nêz ve dît. Jiyana wan di perwerdê de, di şikeftan de, di ber zinaran de, di rê de şopand. Li çîrok û hestên wan guhdarî xir. Xewnên wan ji bo jiyanek azad, civakek di nava aştiyê de, li welatekî ji bo hemû reng û dengan bihîst. Dijwariyên ew di nav de dijîn bi çavên xwe dît. Tê de jiya. Hin caran bi wan re kenî, hin caran jî têra xwe girî.

Fréderike Geerdink, yek ji rojnamevanên xwedî ojdan e û di her du pirtûkên xwe de dide xuyakirin. LI rastiyê digere, rastiyê dinivîse û li maf û pêdiviyên Kurdan dipirse.

Ji ber ew bi salan rewşa Turkiyê şopand gelek rojnamevan û rewşenbîr nas kirin. Gelek ji wan Kurd bûn. Bi wan re hevaltî kir. Mixabin pirraniya wan niha di girtîgehande, bazdayî ne. Hin ji wan jî kuştî ne.

Fréderike Geerdink di destpêka berhema xwe de weha dinivîse: ez vê pirtûka xwe pêşkêşî hevalên xwe, rojnamevanên bazdayî û di girtîgehande dikim.

Rojnamevanî ne sûc e.

‘Ji bo min bawernameya Şahadetê ji ya refa 12’an bihatire!’

Bavê Şehîd Ezîz Ereb: Min jê re got ku tu yê çawa zilmê li ser mîlyonan rabikî, ev ne pêkan e? Wî jî ji min re got ku em ê bi yek dengî û bi yek destî li ser hemû gelan zilmê rabikin.

Ezîz Ereb, di salên 1980’de yekemîn ciwanê Ereb ku tevlî Tevgera Azadiya Kurd dibe. Heman demê, Ezîz Ereb yekemîn şehîdê Ereb yê Tevgera Azadiyê ye. Îro di nav gelê Kurd û Ereb ên li Bakûr û Rojahilatê Sûriyê dijîn de Ezîz Ereb, weke pêşengê yekemîn ê Tevgera Azadiyê tê nasîn. Bavê Ezîz Ereb Hesen Şêx Hesen, li ser jiyan û tevlîbûna kurê xwe axivî.

Hesen Şêx Hesen, di despêka axaftina xwe de dibêje ku wan pêşî di hizirandin û tevgerîna wî ya jiyanê de guhertin didîtin lê fêm nedikirine ka ev guhertin ji çi ye û wiha dibêje; “Piştî ku Ezîz refa şeşemîn qedand, ji bo berdewamkirina xwendina xwe, derbasî Efrînê bû. Li wir heya refa 9’mîn xwend û careke din vegeriya Helebê. Wê demê me dît ku di hizrandina Ezîz de guhertinek çêbûye.

Di sala 1981’ê de Ezîz û çend hevalên xwe hatin malê. Roja din ji min re got, ‘ez ê bi qasî du mehan ji vî welatî derbikevim.’ Min jê re got, ‘tu yê bi kû ve biçî? Ma rewşa me ya aborî jî başe.’ Wê demê ji min re got ku wê biçe Lîbyayê. Piştî ku çû Lîbyayê, ez pê hesiyam ku Ezîz tevlî Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) bûye. Ji me tu kesî nizanibû ka ev partî çi ye, ji bo çi kar dike. Lê ji min re weke tiştek normal dihat. Dema ku li Lîbya bû, me bi hev re name dişand. Rojekê ji min re wiha nivîsîbû, ‘Bavo ger ku tu bizanibî, îro li Tirkiyê li ser gelê Kurd çi zilm tê meşandin, tu yê ji min re bêjî biçe û wê zilmê rake.’ Min jê re got ku tu yê çawa zilmê li ser mîlyonan rabikî, ev ne pêkan e. Wî jî ji min re got ku em ê bi yek deng û bi yek destî li ser hemû gelan zilmê rabikin.

Di sala 1982’an Ezîz û çend hevalên xwe ji bo di bexçe û zeviyên çandiniyê de kar bikin çûn herêma Zêwiyê. Li wir fêkî û sebzeyên ku ji çandiniyê kom dikirin, li ser endamên rêxistinê belav dikirin. Salekê ew kar berdewam kir.

MIN DESTÊ XWE LI PIŞTA WÎ DA JÊ RE GOT, ‘SERKETIN JI TE RE!’

Sala 1984’an li Lîbyayê birayê min ji min re nameyek şand. Di nameyê de digot, ‘‘Kurê te bi balafirê tê û wê bê gel te.’ Ez rabûm min berê xwe da balafirgehê. Lê dema ez çûm min Ezîz nedît. Ez rabûm çûm gel kurê apê xwe ê doktor. Wî jî ji min re got ku Ezîz hatiye gel wî û şevek li gel wî maye û çûye gel doktorekî din. Dema ku ez çûm gel wî doktorî, wî jî ji min re got, ‘kurê te hat, pênc rojan ligel min ma û çû. Lê dema hat gel min, ne bi navê Nadir hatibû, bi navê Ezîz hatibû. Jixwe piştre ez çûm gel hevalê wî û wî ji min re cihê wî got û ez çûm ligel wî. Dema ku ez çûm ligel wî min hemêz kir, destê xwe li pişta wî da û jê re got, ‘serketin ji bo te.’

KURÊ MIN GIHIŞT XEYALÊN XWE

Piştî 15 rojan ji min re nameyek şand û di nameyê de digot ku ez ê biçim Tirkiyê. Her wiha di 5’ê mehê de ji min re nameyeke din hat û di wê namê de digot ku Ezîz şehîd ketiye! Ez rabûm hatim malê. Dema ez gihiştim nêzî malê min dît li pêşiya mala me nêzî 600 kesî kom bûne. Ez dema ketim malê, matmayî mam. Dayîka Ezîz direqisî û digot kurê min gihişt şahadetê. Destpêkê min got dîn bûye. Lê ew zîvirî û ji min re got, kurê min berê ku biçe ji min re got ku ez ê şehîd bikevim. Min got ‘çawa ji te re got ez ê şehîd bikevim?’ Wê got, ‘dema Ezîz refa 12’an qedand, difikirî ku biçe. Min jî jê re got, berê ku tu biçî bawernameya xwe ya refa 12’an bistîne wisa biçe. Wê demê ji min re ev got; bawernameya şahadetê ji bo min baştire ji bawernameya refa 12 mîn!”….*ANF*

Li Hesekê vekirina pirtûkxaneyek ji hezar pirtûkan

Bi armanca teşwîqkirina xwendina pirtûkan, belavkirina çanda xwendinê û geşpêdana şarezayan bi taybet di nav ciwanan de, Komîteya Çand û Hunerê ya Kantona Hesekê amadekariyên vekirina pirtûkxaneyek ku ji hezar pirtûkan pêk tê dike.

Di pirtûkxaneyê de niha 300 pirtûk bi zimanên Erebî û Kurdî hene. Tevahiya pirtûkan girêdayî lêkolîn, wêje, çîrokên şervana, helbest, roman, bîranîn, destan û evsane, pirtûkên girêdayî jin ê û pirtûkên Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan in. Pirtûkxane dê were firehkirin da ku hezar pirûkan bihewîne ji tevahiya ziman û gelek cureyan. Her wiha dê cihek taybet di avahiya Meclisa navçeya Rojava ya Kantonê de were eyarkirin.

Girêdayî projeya avakirina pirtûkxaneyê endama Rêveber a Komîteya Çand û Hunerê ya Meclisa Kantona Hesekê Efaf Hesekî destnîşan kir ku bi armanca avakirina nifşek zana û ji xwendina pirtûkan hez dike, di heman demê de nifşek avaker û afrîner ev proje hate fikrandin.

Rehên mirovî

Sîpan ŞÎNDA

Mirov jî weke dara, xwedî rehin. Ev rayên hanê mirovî jiyanê ve girê didin. Çawe dema mirov darekê ji ra ve bibire êdî ew hişk dibe, mirov jî welê ne. Dema rehên mirovî yên jiyanê hatin qut kirin, mirov ji ber bi mirinê ve diçe û dimire! Ya rast rehên mirovan yên jiyanê gelik kûrin, stûrin û qayînin. Ji ber wê dema rayên mirovî bi derekê ve hatin girêdan, êdî ew bi awayekî hêsanî ji wir qut nabin. Dera rehên mirovî pêve tê girêdan, êdî ew sedemê jiyana mirovî ve. Girêdana bi malbatê ve, ya dê, bav û zarokan ve, ya olî ve, ya xwedayekî ve, ya welatekî ve rehên mirovînin.

Weke rayên firîzê çawe pencên xwe tavêje di nava axê de û belav dibe, rehên mirovî ji bi çavkaniyên xwe ve bi awayekî xurt tên girêdan. Mirov hez kirin, bawerî, parastin, aîdiyeta xwe di van rayên xwe de dibîne. Ew serkaniya jiyana mirovînin. Dema ev reh tên qut kirin, weke dara sencol kirî çawa hêdî hêdî di halê xwe de hişk dibe, mirov jî hêdî hêdî di halê xwe de zuha dibe. Ji bo mirovekî surgun, ji welatê xwe, ji axa xwe, ji malbat û hezkiriyên xwe dûrketin, ji hiş û bîranînên xwe, mekanê xwe dûr ketin qut kirina rehên mirovî yên ji jiyanê ne.

Dema mirov ji rehên xwe qut dibe, hiş û mejiyê mirovî, giyanê mirovî têk diçe. Mirov bê xwediye, kore. Mirov her tim di nava livekêde ye. Liveka bê wate! Jiyan li ber dilê mirovî tehle, şêrîn nabe. Mirov her tim di nava tevgerekê de ye kû tiştekî bibîne rehên xwe pêve girê bide, lê biçîne. Lê ne ewqas hêsaniye mirov rehên xwe yên jiyanê ji nû ve derna ve girê bide, yan ji li derna biçîne. Ji ber kû her çend mirov bi awayekî ji rehên xwe dûr ketibe jî, bes rehên jiyana mirovî hê ji dera lê şîn bûyî dijenin. Hê ji hêviyên xwe yên jiyanê ji wir distîne. Dema cî, mekanê mirovî bi awayekî tê guhertin, rabirdûya mirovî dimire. Ma hêsaniye mirov bikaribe rabirdûya xwe bikuje? Mirov her tim di valahiyekê de dijî. Dera mirov diçe lê ji, mirov nikare bi awayekî hêsanî rehên xwe bi wir ve girê bide. Ji ber kû mirov xwe aîdê wê derê nabîne. Ji ber kû mirov rehên xwe ji cî yê kû mirov xwe aîdê wêderê dibîne qut nekiriye. Lê mirov ji wir jî derketiye! Çi mal xirabîneke! Çi mal wêraneke! Mirov dixwaze rayên xwe yên jiyanê di nava xwe de biçîne, xwe bi xwe bigire. Lê ew jî xapandineke. Ji ber kû ew jî ne tişteke xwezayî ye.

Kesên kû bê reh bin, hema her tim di nava lêgerînekêde ne. Tu caran hizûrê nabînin. Her tim valahiyek di nava wan de heye. Ew valahiya di nava wan de, jiyana wan tar û mar dike, têk dibe. Her tim li pey dikevin kû rehên xwe derna ve girê bidin. Carna tiştina peyda dikin, lê paşê dibînin kû ew jî pûçe. Dibêjin vê carê çênebû, careka din. Li pey dikevin kû xwe bi tiştekî bigirin. Lê peyda nakin. Her tim li benda mizgîniyekê ne. Mizgînê wan Ezraîle, mizgîniya wan jî mirine! Belê ew bi axîn, kul û keserên xwe ve dibêjin hema ka termê me bibin li cî yê kû em aîdê wê! Raste her dar li ser rayê xwe şîn dibe. Lê her mirov bi rehên xwe geş dibe.

Hest û mêjiyê şiyar

Medenî FERHO

Kurd di azmuneyeke mezin re derbas dibin. Serdem, belkî ji serdema Kawayê Hesinkar girantir e, belkî na, dîse jî bêyî lutufkariyekê em bêjin: Kurd, hem li dijî faşizma dewleta Îttîhadî û çeteyên ala reş, hem li dijî kesayeta ketî ya di nava xwe de, bi lehengiyek ciwantî û hêviyek destanî têkoşînê dikin.

Faşizma Îttîhadî, ji faşizmên di dîrokê de hatine dîtin teva dijwartir e. Aliyekî wê şûr û mertal e, aliyek Koma Mehteran e, aliyek jî lîstika efeyan e… Sê lîstik jî, wek foklor têne bikaranîn. Lê, ev lîstik ji krîter, krîtîka kulturî û girêdana civakî dur in. Aheng û muzîka wan jî transfîgurên xezebê ne.

Folklor, “tonalîte-aheng”a civakê ye û bi mîzansenek rengîn mirovan himbêz dike. Di sê lîstikên Tirkan de, ev nînin.

Kurd li dijî dijminekî wiha û çeteyên ku di nava çend mehan de biqasî hêzên mogolî, cîhan kirin nava tirsê têkoşînê dikin. Çete, vê kêliyê têk çûne. Lê, dikare ji nişka ve derkevê û agir bibarîne.

Di van mercên giran de, berxwedana bi hezaran lehengên Kurd heye û mecburiyetek heye. Her Kurd divê di vê barhilgiriya giran de hebe. Rojnamevan û nivîskarên Kurd jî mecbur in. Rojnamevan jî mecburê mijulkariya vê rojeva giran in.

Tecrîd, bandorê li jiyana her eniya Kurdan dike. Îdealîzekirina tecrîdê jî çênabe. Tecrîd îzole kirin e, mirina bi saxî ye, ji nû de metfûnkirina di gora betonî de ye!... Piştî her operasyona leşkerî û siyasî, piştî her bombardumana li cografya Kurdistanê, medya tirk, gorên nû ji Kurdan re amade dike. Mecbiriyet e, medya Kurd jî bersiv e.

Kiryarên faşîzan, rojane diyalektîka hişmendiya Kurd dikujin. Her kuştina diyalektîkî dibe sedema winda kirina tonalîteya civakî. Ji ber vê yekê, rewşenbîriya Kurd jî nabe xwedî hişmendî û hewngîriyeke xas î Kurdî. Oblomovtî serdest e!..

Rê li ber Kurdan hatiye girtin; riya siyaseta demokratîk, têkoşîna entelektuelî, rêxistinî, kulturî, hunerî, wêjeyî, perwerdeyî, folklorî, aborî û hwd…. Tecrîd, zexta li girtîgehan, qedexeyên waliyên Tirk, bombarduman, operasyon, xespkirina îradeya gel, girtina nunerên gel û siyasetmedaran, di kolanan de trimbêlên zirxî… Ev bahoza fetisandinê ye û tenê sîstemên faşîst dikarin vê bikin.

Kurdê ku ji têgihiştin û fêmkirina vê bahoza fetsînok bireve, tewlan bide xwe, kîvroşka bi çavên vekirî razayî ye!... Faşîzma Îttîhadî, di serdema Erdogan, ku Tirkiye bûye Erdoganland, îzolekirin, li ser civakê, siyasetê, kultur, entelektuelî û cografya Kurdan bi îşka sexmeyî şidandiye.

Ev serdemek dîrokî ye, întelelîjansiya Kurd jî nikare xwe ji vê serdemê dûr bike. Her gel, baş ne baş xwedî întelîjansiya ye û biqasî rewşenbîrên xwe pêşketî ye!... Li cîhanê, ti gel, reben, xeşîm, ji ronahiyê dûr nine, nabe û li dijî diyalektîkê ye. Eger hebe, ji rebenî û tengezariya inteklîjansiya xwe ye. Înkara vê rastiyê windakirina diyalektîka hişmendiyê ye.

Kurd di qonaxek giran de ne. Bi hezaran lehengên hêviyê, gav bi gav bi bi şehadetê ve diçin… Her Kurd, bûye bi hezaran bedena bi qolinc û dilên lewaz… Divê Kurd bi siyasetek rasyonal haraket bikin û desturê nedin mirinê. Di demeke ku, biwêjên edebî, siyasî û felsefî têra nirxandinan ne dikirin, hilbijartinên herêmî kirin rojevê. Faşîzma Îttîhadî, hesabek dikir; lê Kurdan ev hesab xera kir û darbeyek mezin li faşîzmê dan.

Lê Kurdan ji bîr kiribû ku, faşîzm bi berxwedana demokratîk têk naçe. Lewma serketin nebû guhertina destîniya faşîzma Erdoganland!... Di vê serdema ku tixibên krtîtîk derbas bûne de, faşîzma Erdoganland, ji bêdengiya xwedawendên cîhanê sûdê digire û dixwaze darbeyek dijwar li Kurdan bide. Divê Kurd, bi şiyarbûnek hest û mêjî bersivê bidin.

YPJ’ê du dewreyên şervanên nû bi dawî kir

YPJ li akademiya Şehîd Bêrîvan 2 dewreyên nû ku ji şervanên Kurd û Ereb pêk dihat bi merasîmeke leşkerî bi dawî kir. Ji fermandarên YPJ’ê Rûken Efrîn jî beşdarî merasîmê bû û ji şervanan re axivî . her wiha şervanan jî nerînên xwe anîn ziman û got: piştî em tevlî nava refên YPJ’ê bûn me nas kir ku rêya azadkirina jinê bi felsefeya Rêber APO re dibe. Şervanan di dawiya merasimê de soza xwe dan.

Dewreyên şervanên nû yên bi navê Şehîd Amara û Şehîd Barîn, ku ji şervanên Kud û Ereb pêk dihat, piştî perwerdeya ji 45 rojan bi merasîmeke leşkerî bi dawî bû û şervanan sond xwarin.

Ji fermandarên YPJ’ê Rûken Efrîn beşdarî merasîmê bû û ji şervanan re axivî. Rûken got: “Em herdu dewreyan li Rêber APO, şehîdan û hevalên ku di greva birçîbunê de ne pîroz dikin û ji hemû hevalan re serketinê dixwazin.”

Merasîm piştî axaftina fermandara YPJ’ê Rûken Efrîn bi dirûşmeya dirûşma “Bijî Serok Apo, bê Serok jiyan nabe” bi dawî bû.

Şervanên ku cihê xwe di dewreyan de girtin, hestên xwe anîn ziman. Şervana YPJ’ê Şêrîn Rustem got: “Me perwerdeya siyasî, birdozî û leşkerî dît, min gelek hevalên ku ji pêkhateyê cude nas kir û me bi kêfxweşî perwerdeya xwe bi dawî kir. Heta ku ji me were em ê bi rêk û pêk tevlî bibin û heya dawî li ser fikirê Rêber APO bimeşin, tola hevalê şehîd rakin û li ber dijminê hov bisekinin.”

Şervana YPJ’ê Hebûn Minbic jî fikir û hestên xwe wiha anî ziman: “Ji bo azadiya Rêber APO û jinan gelek hevalên me yên hêja şehîd bûn. Vê yekê bandoreke mezin li min kir û ez tevlî nava refên YPJ’ê bûm. Li vir min gelek heval nas kirin û ruhê hevaltiyê dît. Min ji perwerdeyê gelek encam girt ji ber armanca me mezin e, ez ê heya dawî li ser fikir û felsefeya Rêber APO bimeşim.”

Şervana YPJ’ê, Arîn Amûdê jî axivî û got: “Ez tevlî nava refên YPJ’ê bûm, ji ber armanca min e ku ez bikaribim her jinekê pêwîstiya wê bi azadkirinê heye rizgar bikim û Rêber APO, di aliyê fizîkî de azad bikim. Ez dema tevlî nava refên YPJ’ê bûm min nas kir ku rêya azadkirina jinê bi felsefeya Rêber APO dibe.”

Merasîm bi gerandina govenda şervanan bi dawî bû.

Alaa Salah: Ne gule, bêdengiya gel mirovan dikuje

Sembola serhildana gelê Sûdanê ya li dijî dîktator Omer El Beşîr, jina bi navê Alaa Salah got ku malbata wê ew hînî hezkirina welat kiriye û ji ber vê jî li destpêkê ve li kolanan e. Alaa Salah di qadên çalakiyan de wiha bang dikir: “Gule nakuje. Ya ku dikuje, bêdengiya gel e’

Li dijî dîktatoriya Omer El Beşîr, ji 7 salî heta 70 salî bi sedhezaran welatiyên Sûdanê li kolanan e. Yek ji van çalakvanan jî Alaa Salah a 22 salî ye. Alaa Salah bûye sembola protestoyên li dijî dîktator Omer El Beşîr. Alaa Salah xwendekara zanîngehê ye û beşa avahîsaziyê dixwîne. Alaa Salah têkildarî protestoyên li dijî Beşîr axivî û wiha got: “Ne gule, bêdengiya gel mirovan dikuje.” Alaa Salah dibêje ku malbata wê, hezkirina welat nîşanî wê daye. Di çalakiyan de jî Salah wiha bangî girseyê dikir: “Ne gule, bêdengiya gel mirovan dikuje.” Salah duh di protestoyên girseyî yên li paytext Hartumê de bi cil û bergên spî derketibû ser wesayîtekê û gotina ‘Şoreş’ qêr dikir. Ev dîmenê Salah weke sembola protestoyên Sûdanê tê nirxandin.

‘Ji welatê xwe hez dikim’

Salah ji The Guardianê re axivî û got ku ew ji dîmenê hatiye kişandin, keyfxweş bûye. Alaa Salah wiha dibêje: “Ez keyfxweş im ku bi saya vî wêneyî hemû cîhan ji şoreşa Sûdanê haydar bû. Ji roja destpêkê ya serhildanê heta niha ez derdikevim kolanan û tevli çalakiyan dibim. Ji ber ku dema malbata min ez mezin kirim, ez hînî hezkirina welat kirim.”

Helbest û stran gotin

Di berdewamê de jî Salah ev tişt anî ziman: “Welate me di navbera partiyên siyasî û mezheban de hatiye dabeşkirin. Di roja wêne hatiye kişandin de ez tev li bi dehan xwepêşandanan bûm û min helbest xwend. Ev helbest bandorê li mirovan dike. Di serî de min komeke jinan ku ji 6 kesan pêk dihat dît û min stran gotin. Wan jî dest bi gotina stranên min kirin. Piştre jî çalakî mezin bûn.” Gotina Alaa ya ‘Gule nakuje. Ya ku dikuje bêdengiya gel e’, di nava çalakvanên Sûdanê de pir belav bûye.

‘Em berxwe didin, hûn jî berxwe bidin’

Ji girtiyên Girtîgeha Jinan a Şakranê yên ji 1’ê Adarê de di grevê de ne, Esma Ayaz, da zanîn ku tevî hemû zextên rêveberiya girtîgehê moralê wan gelek baş e û wiha got: “Em bawer in ku serkeftin ya me ye. Heta em bi dest nexînin em dest ji vê grevê bernadin. Encam çi dibe bila bibe em ê bi ser kevin. Em bawer dikin, hûn jî bawer bikin.”

Çalakiya greva birçîbûnê ya Hevseroka KCD û Parlamentera HDP’ê ya Colemêrgê Leyla Guven ku bi armanca tecrîda li ser Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan bê rakirin dest pê kir, di roja 163’emîn de didome. Piştî Leylayê di 16’ê Kanûnê de gelek girtî û ji derveyê welat gelek kesî piştgirî da û dest bi grevê kirin. Ji 1’ê Adarê şûnde jî li hemû girtîgehên herêmê û Tirkiyeyê grev hat destpêkirin.

Ji Girtîgeha Jinan a Şakranê ya Îzmîrê Esma Ayaz jî ji 1’ê Adarê heta niha di grevê de ye. Esmayê bi hevkariya malbata xwe peyamek şand û da zanîn ku tevî hemû zextan moralê wan gelek baş e.

‘Serkeftin wê ya me be’

Esmayê di peyama ku şandî de wiha dibêje: “Rewşa kesên di koma yekem de cih digire gelek giran bûye. Em bi 3 koman ketin grevê. Ev grev bi moral û berxwedanek mezin didome. Hinek hevalan gelek kîlo daye. Di hefteyên dawî de êşa mîdeyê û serî dikşînin. Ji bilî wê moralê me gelek baş e. Serkeftin a me ye, em bi wê bawer in. Heta em qezenc nekin wê ev grev bidome. Encam çi dibe bila bibe em ê bi ser bikevin. Em bawer in, hûn jî bawer bin. Heta tecrîd neşkê em ê şûnde gavê navêjin. Em ji Leyla Guven û Nasir Yagiz re silav û rêzdariyên xwe dişînin. Em her kesên berxwe didin silav dikin. Ji bilî vê jî zext hene. Du rojan carê bi ser koguşan de digirin. Rojname an jî tiştekî din nadin me. Televîzyonên me jî girtin. Ji bo em ji derve agahiyê negirin her tiştî dikin. Lê ev ji bo me ne pirsgirêk e. Heta ji destê me bê em ê berxwe bidin. Em berxwe didin, hûn jî berxwe bidin.”

Bêrîkirina kêliyên azad, an jî xwebûyînê

Gulîstan XALID

Her mirov di jiyana xwe de bêriya hin kêliyên ku derbas bûne dike. Lê mirovatî bêriya serdemeke ku beriya hezarên salan hatiye jiyîn, dike. Dixwazî bera zanebûna wî derbarî wê serdemê de hebe tu dixwazî bera nebe. Serdemeke ku di kûrahiya hestên mirovan de bandora xwe daye avakirin ku ew di giyana mirovan de zindî dibe. Yanî ji xwede hin hest, lêger û hin xeyal ava nabe. Ger ku berê tama wê nekiribe bêriya wê nake.

Yanî çima sistemeke ku bi hezarên sala heye, lê dîsa jî li hemberî wê serî rakirin çêdibe, ev sistemê ku ji civakan re zagon, pîvan û kevneşopiyan dide diyar kirin çima di mirovan de tam elimandin û qebûlkirinekê nade avakirin!.. gelo dibe ku bersiva vê cewhera mirov bi xwe be!. Yanî binesaziya hêşê civakî (hafîzeya mirovatî) bi xwe be.

Yanî sistemeke ku ne li gorî cewhera mirovan pîvana diyar dike, zagonan ferz dike ku ev dibe sedemê şerkeriya mirov ya hundirîn û derve jî. Ev tê wateya ku civakan çiqas di şekil de weke ku tiştên hatine ferzkirin qebûlkirbin jî, di hundir de herdem guman, nerazîbûn û nakokiyên kûr hatine jiyîn. Dema ku ev nakokî kom dibin, giran û dighêje asta ne tehmûlkirinê wê demê bi xwe re potansyala teqandineke civakî ava dike.

Min di jor de jî gotibû ku her mirov bêriya demeke xwe ya derbasbûyî dike, ez bawerim piraniya me jî em bêriya dema xwe ya zaroktiyê dikin. Jiber ku di wan temenan de em hîn bi ser zagonên hişk yê ku li ser civaka me hatine ferzkirin, piştre civaka me jî mecbûr dimîne ku wana li ser me ferz bikin ve venebûne. Jiber ku hîn bi çavekî ku em zarokin û tiştek faam nakin tê nerandin, jî lewma pêwîstiya ku li ser me were ferzkirin tune ye. Ev jî bi kêrî me di wan deman de tê. Qe nebe piştre em faam dikin ku kêliyên me yê herî azad kêliyên di zaroktiya me d bûn.

Em di zaroktiyên xwe de bêtir serbest û kêm metirsîne. Ferasetên ku civaka me li gorî wê teşe girtine em hîn nas nakin. Her ku diçe em matmayî dimînin û mejiyê me ser hev şoqa jiyan dike. Îja ya em dibine tabî bê ku em îqna bibin yan jî em her di têkiliya xwe ya bi civaka xwe re di îsyanan de ne. Bê guman her du rewş jî ji bo jiyana mirov pirsgirêke, em dikarin bêjin pirsgirêka xwebûyînê ye, ya azadiyê ye.

Ez wer nafikirim ku ev pirsgirêk tenê ji bo jin heye, zilam zêdetir vê pirsgirêkê jiyan dike. Pirsgirêka xwebûyînê, xwebûyîna weke mirov..... jiber pîvanên ku ji bo teşe dayîna kesayetiya zilam zêdetir çorsin. Lê di encam de em bermberî zagonên hişk yê ku li ser civakê bi giştî hatiye ferzkirin rû bi rû ne. Ger ku em vana rast lêpirsîn û pênase nekin emê her bêrîkirinên xwe yê ji azadiyê re jî bi êşên kûrtir jiyan bikin....

‘Divê rêjîm li hemberî Tirkiye helwesta xwe diyar bike’

Berpirsê Komîteya Têkiliyên Doplomasî yê herêma Efrînê Mihemed Hesen pêvajoya piştî têkçûna DAIŞ‘ê, berdewama zêdegaviyên Tirkiyê li Sûriyê û pêvajoya pêşeroja Sûriyê nirxand. Mihemed Hesen diyar kir ku dagirkeriya Tirkiyê dîwaran li Efrînê lêdike da ku tevlî axa Tirkiyê bike. Mihemed Hesen ji rêjîma Sûriyê xwest ku helwestê nîşanî binpêkirinên Tirkiyê bike.

Berpirsê Komîteya Têkiliyên Doplomasî yê herêma Efrînê Mihemed Hesen diyar kir ku dagirkeriya Tirkiyê dîwaran li Efrînê lêdike da ku tevlî axa Tirkiyê bike. Mihemed Hesen ji rejîma Sûriyê xwest ku helwestê nîşanî binpêkirinên Tirkiyê bike.

Mihemed Hesen diyar kir ku têkçûna çeteyên DAIŞ‘ê li Sûriyê dê wekî din gelek encamên baş bi xwe re bîne û wiha pê de çû: “Yek jê geşkirina fikrê demokratîk di navbera hemû pêkhateyên Sûriyê de ye. Her wiha çeteyên DAIŞ‘ê piştî berxwedaneke dîrokî ji aliyê Hêzên Sûriyeya Demokratîk ve di aliyê erdîngarî de têk çûn. Lê şaneyên wê yên veşartî hîna zindî ne, ji ber ku fikirê DAIŞ‘ê beriya ku leşkerî be tundraw e. Ji ber vê yekê şerê li dijî şanyên veşartî hîna berdewam e. Divê neyê jibîrkirin ku Tirkiye hîna jî destekê dide şaneyên veşartî yên DAIŞ‘ê. Armaca wan ewlehiya herêmên rizgarkirî xirab bike.”

‘TIRKIYE JI BÊDENGIYA RÛSYÊ SÛD DIGIRE Û DÎWARAN LÊDIKE’

Hesen got: “Heger Tirkiye dîwarên çemento li kantona Efrînê lêdike, ev yek nîşan dide ku Tirkiyê ji bêdengiya Rûsya sûd digire û planên xwe yên parçekirina Efrînê ji Sûriyê pêk tîne. Dixwaze tevlî axa Sûriyê bike, wek Lîwa Îskenderon ku piştî demografiyayê wê guhret tevlî Tirkiyê kir.”

Mihemed destnîşan kir ku Erdogan bi van siyasetan dixwaze pirsgirêkên xwe yên navxweyî veşêre û got: “Tirkiye hewl dide xaka Sûriyê tevlî xwe bike û rêya guhertina xwediyên erd û milkan demografiya herêmê biguhere. Her wiha ji bo aboriya xwe xurt bike herêmên ku dagirkirine talan dike.”

‘HEGER REJÎMA SÛRIYÊ DIXWAZE EWÊ YEKÎTIYA XAKA SÛRIYÊ BIPARÊZE’

Girêdayî bêdengiya rejîma Sûriyê li hemberî guhertina demografîk li herêmên Tirkiyê ku dagirkirine Mihemd got: “Heger rejîma Sûriyê bi rastî dixwaze yekîtiya xaka Sûriyê biparêze û divê helwestekî li hemberî binpêkirinên Tirkiyê û bêdengiya Rûsya nîşan bide. Divê Rejîm li gorî berpirsyartiya xwe ya dîrok be, ji ber xaka Sûriyê wekî hev e û bostek ji yek din ne cuda ye.”

‘DIVÊ GELÊ SÛRIYÊ DESTEKÊ BIDE DIYALOGA SÛRÎ-SÛRÎ’

Mihemed Hesen di dawiya axaftina xwe de got: “Herêm ber bi nakokiyên navdewletî ve diçe. Her aliyek dixwaze berjewendiyên xwe yên stratejîk pêk bîne û aloziya leşkerî gur bike. Em ji hemû Sûryeyiyên welatparêz re dibêjin piştgiriyê bidin diyalgên Sûrî-Sûrî. Da ku planên derve yên parçekirina Sûriyê têk neyên. Destûrek nû ji aliyê hemû pêkhateyan ve were danîn.”....***ANHA***

Dijminahiya Tirkiyê li dijî gelê Sûriyê kevin e

Dijminahiya Tirkiyê li dijî gelê Sûriyê di aloziya Sûriyê de eşkere bû. Lê di rastiyê de binpêkirinên Tirkiyê yên li ser gelê Sûriyê ji beriya aloziya Sûriyê bi demek dirêj in. Qutkirina ava çeman yek ji rêbazên şerê Tirkiyê li dijî gelê Sûriyê ye.

Tirkiyê di dirêjahiya dîroka xwe de gelek binpêkirin li dijî dewlet û gelên cîran de bi armanca dirêjkirina hegemoniya xwe pêk aniye. Yek ji van mînakan jî qutkirina ava çemên ku ji Tirkiyê diherikin xaka Sûriyê, mîna çemê Qiwêq.

Çemê Qiwêq ji başûrê Tirkiyê ji girê Entabê diherike. Piştre tevî du şaxan derbasî xaka Sûriyê dibe. Di Kilsê re derbas dibe piştre Dabêq, El-Dûbîq, Til Malid, Seyd Elî û Semûqa di dawiyê de dikeve bendava Şehbayê. Îpiştî bendavê ber bi gundên Werdiye, Hasîn, Fafîn, Mislimiye, Eyn Til, Cendûl, Bistan Başa, Şêxmeqsûd, Mîdan, Navenda bajarê Helebê, Sikerî, Wedihî û li herêma El-Metix piştî qutkirina 110 km bi dawî dibe.

Tirkiyê di sala 1985’an de bendav li ser çem çêkir û ji wê demê ve çem li ser axa Sûriyê qut bû.

Tirkiyê bi wê tenê nekir, riya herikîna çem ber bi Deryaya Spî guhert da ku bi temamî Sûriyê ji ava çem mehrûm bike. Li rex ku jêdera ava vexwarinê bû, zeviyên bi rûbarên 5 hezar hiktar av dida. Ji ber hêza çem berê şêniyan aşên avî bi kar dianîn û zeviyên li ser giran av didan. Di van demên dawîn de ji ber kombûna ava çemê li paş bendava Şehbayê carek din rabû. Lê ava çem niha ne pak e ji ber ku bermahiyên toreyên kanalîsazyonê dikevinê....

.ANHA

Civaka rexne gir û rista xwe

Qasim ENGÎN

Em hemû di nava pergala dewletgerî de mezin bûn, me di dibistanên dewletan de xwendiye an jî jiyaye. Bi gotinek din, dewletan heşmendiya xwe di kesatiya me de avakiriye. Bi vî awayî dewletan hiştiye ku em bi şêweyekê hêşmendiya wan bijîn. Dewlet forma herî bilind ya desthilatî ango deshilatî saziya dewletê de xwe pir bi xûrtî rêxistin kiriye. Bedena desthilatdarî, dewlet e.

Dewlet û desthilatdarî, mekanizma dest danîna ser nirxên civakê ye. Dewlet ji civakê re xeteriyek gelek mezine. Ruxmî ku dize, xwe wek parêzvanek civakê; ruxmî ku hêza destwerdanê ye, xwe wek hêza ku civak jê dûr nekeve, dêwek mêtinê ye lê xwe wek hêza parveker, ruxmî ku xwezaya civakê perçe dike, xwe wek hêza nîzama civakê nîşan dide.

Bi gotina Frîedrîch Nîetzche; ”Ew cinawirê herî cinawire.” Dewlet dema xwe avakiriye, di kesayatiya kesên ku wê afirandiye de jî xwe dide avakirin û jîn. Dewlet avakirine, bi şêweyekê xwe di me de didin jiyandin. Derbarê vê de Rêber APO ji bo zilamên ango mêrên malê re, gotina Împaratorê biçûk kar aniye. Împaratorê biçûk di cewherê xwe de marketa biçûk yê împaratorê mezin e. Ger dewletek- desthilatdariyek vê rastiyê di tevahî xûlamên xwe de nade avakirin, nikare xwe li ser piyan bigire. Ev xapandinek ewqas mezin e ku, zilamê malê ruxmî ku xûlamê împarator û dewletê ye, xwe wek zilamek azad heta împaratorê biçûk dibîne. Xwe di kesayetiyan de avakirin an jî xisleta dewletê di kesan de dane rûnişkandin tam jî ev rastiye.

Em dirêj nekin, îro di Rojava de şoreşek bi rêve diçe. Kî dikare bêje ku hemû tişt li gora felsefa Rêber APO ne? Ruxmî ku hemû şoreşgerên Rojava û heta Bakûrê Rojhilatê Surî xwe wek şopdarên felsefa Rêber APO dibînin, ev wiha ye.

Hişmendiya ku dewletên mêtinger û pergala kapîtalîst modernîst di me de avakirine bi şêweyekê –di niyetan de em dijî wan jî bibin- xwe di xebatên me, di peywendiyên me bi civakê re û her wiha di meş û fikrên me de xwe didin jîn.

Bêguman ev li ser şêweya; siyasetê me, şerê me, aboriya me, tendurustiya me, li ser meşandina şaredariyên me û heta li ser şêweyê rêveberiya me jî bi bandor e. Heta caran ewqas bi bandore ku, tiştên ku tên kirin, tên jîn, tên fikrandin bi yên Rêber APO re bi nakokin.

Evane gelek caran bi niyetan ve ne girêdayînin. Gelek caran bi tam ne naskirina felsefa Rêber APO re, bi kesayetiya me ya seraser ve jî girêdayî dibin. Di encam de nakokî bi felsefa Rêber APO re henin. Bêguman gelek tiştên baş jî hatine kirin û hêna jî tên kirine. Lê rastî ew e ku, tiştên ne li rê jî henin.

Gelo hêza herî xûrt û bi bandor ya ku bikaribe şaşitiyên ku tên jîn, kî dikare rast bike?

Kî dikare, bibe hêza ango mekanîzma kontrolê?

Kî dikare xwe bike vîcdanê şoreşa Rojava?

Bersiv; Hêza herî bi bandor û xûrt ew civaka ku xwe bi raman û zimanê Rêber APO avakiriye. Ger em xwe wek endamekê/î şoreşê dibînin, wê demê pêwîste em xwe li ber şoreşê jî berpirsiyar bibînin. Yek ji berpirsiyariya me parezvantiya şoreşê jî ew e ku, li hember tiştên ku şaş rêvediçin rexne bikin, û herkesî dawetî van rastiyan bikin e!

Li ser gelan hesabên şaş nekin!

Ezîz KOYLUOGLÛ

Ev demeke navê êrîşkarî û dagirkeriya dewleta Tirk bûye ‘herêma bi ewle’. Niha ji bo ev dagirkeriyê pêk bîne bi DYE re ketiye nava bazaran. Ev çend roj ji civîna aborî ya dinavbera Emerîka û Tirkiyê de ji wezîrê parastina Tirkiyê bigre heta wezîrê aborî gelek kes li Emerîka bû. Di van civîna de tişta di ragihandinê de derket pêş gelek mijarên nakok yên her dû alî hatine nîqaş kirin. Dewleta Tirk ya dibin dîktatoriya Erdogan’de ye, bi hevkarê yê 65 sala Emerîka re li ser hesabê Rûsya nakokiyên cidî jiyan dike. Bingeha nakokiyan ya Emerîka û Tirkiyê, siyaseta Erdogan ya dagirkeriyê ye. Erdogan è demeke dixwaze peymana Lozanê xerab bike û bitaybet Iraq û Sûriyê dagir bike. Ji ber ev siyaseta xwe bi hêzên cîhanî re ketiye nava nakokiyan. DYE ji siyaseta dewleta Tirk ya dagirkeriya herêmê xistiye rojeva xwe, bigumane. Li beramberê wê Rûsya ji bo nakokiyên Tirkiyê û Emerîka kûr bike, bi destûr rê dide dagirkeriya dewleta Tirk ya li ser herêmên Kurdî. Li gora Rûsya, Tirkiyê nikare herêmê Kurdî demek dirêj didestê xwe bigre, lê dizane ku rêdana dagirkeriya dewleta Tirk ya bidûstûr, nakokiyên Tirkiyê û Emerîka kûrtir dike. Rûsya li ser vê nakokiyê her diçe Tirkiyê nêzîkî siyaseta xwe dike.

Ev demek grûbek dinava Dewletê Yekbûyî Emerîka jî dixwaze wek Rûsya tevbigere û bi wek Rûsya çewa dike bidestûr û bisînor rê bide dewleta Tirk, hinek cihê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê dagir bike. Li gora vê grûbê ger bidestûr rê bidin dewleta Tirk hinek herêma dagir bike, wê Tirkiyê siyaseta xwe ya heta niha bi Rûsya re ava kiriye lewaz bike. Bi taybet dimijara S-400, xeta xaza xwezayî ya Tirk Akim û hwd. Xuya dike ku ev hedefa Emerîka dibe ku li herêmê nakokiyan zêde bike û şerek nû li herêmê derxe. Ger şereke wiha derkeve diyare wê ji bin serweriya wê namîne û dibe ku li herêmek fireh belav bibe. Çinkî di zîhniyeta gelê herêmê dema tê gotin tenê êş û kuştin tê bîra mirovan.

Divê ez livir rastiyekî li ser dagirkeriya dewlet Tirk ya li ser herêmên Kurdî yên li Sûriyê bêjim ku, dervî grûbên radîkal, DAIŞ, Cephet El Nusra û yên wek kes hebûna dewleta Tirk li Sûriyê naxwaz e. Gelê Kurd, Ereb, Suryan, Asûr, Tirkmen bi yek dengî dibêjin em dagirkeriya dewleta tirk li ser axa Bakur û Rojhilatê Sûriyê naxwazin. Ev rastiya ku di navbera 1914-1923`yan de Osmanî li dijî Ermen û Suryan de komkujiyên der mirovî pêk anîn. Di encam de milyonek û 500 hezar kes ji her du pêkhateyên Ermen û Suryan yan koçber bûn yan jî hatin kuştin. Dewleta Tirk ya dibin destê Ataturk ve û lihevkirina 1926`an heya niha dagirkeriya Tirk hovantirîn sûcan der heqê kurdan de pêk anîn.

Dagirkeriya Tirkan li ser erda Erebî ya 400 salî de gelê Ereb êşekî mezin jiyan kirin. Gelek komkujî der heqê wan de pêk hatin ji komkujiya Necdê sala 1818`an bigire heya komkujiya Bexdayî 1831`an, komkujiyên der heqê Şîa li Iraqê. Piştre komkujiyên Lubnanê ji 1841 heya 1860`î li navçeyên Hasîba, Şûf, Metin û zêdetirî 82 hezar Lubnanî bûn qurban. Komkujiyan li dijî êla El-Miwecde li bajarokê Kerik ê Urdunê û kuştina wan bi hovantirîn şêwazan. Koçberkirina şêniyên El-Medîna El-Munewera Sefer Berlik sala 1917`an. Gelên Ereb di dîroka xwe ya bi Tirkan re bi dehan komkujiyan re rû birû hatin.

Gelê herêmê dewleta Tirk wek dewletek dagirker dibîn e. Ji bo wê jî hebûna dewleta Tirk bitaybet li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê qebûl nake. Divê Dewletê Yekbûyî Emerîka jî şaştiyek wiha neke ku, dewleta Tirk dibin siya Emerîka ve ev herêma dagir bike.ovajî vê wek hatiye lihevkirin parastina sînoran diçarçova êrîşkariya dewleta Tirk bêrawestin be.

Gelo dê senaryoya Efrînê li Til Rifatê dubare bibe?

Gelek gotegotên girêdayî rewşa navçeya Til Rifatê, lihevkirina Rûsî-Tirkiyê ku dê senaryoya Efrînê lê were dubarekirin belav bûne. Ji aliyekî din ve metirsiyên êrîşek leşkerî li Til Rifatê zêde dibin. Di rewşek wisan de dê karesatek mirovî rû bide û 25 hezar sivîl koçber bibin. Hevserokê Meclisa navçeya Til Rifatê Mihemed Henan teqez kir ku ew hewl didin pêdiviyên şêniyan li gel şert û mercên dijwar ên dorpêçê peyda bikin.

Til Rifat girêdayî kantona Şehbayê ye û dikeve gundewarê bakurê Helebê. Zêdetirî 22 hezar sivîl ji şêniyên Efrînê tevî, 2 hezar û 500 jî şêniyên resen ên navçeyê li Til Rifatê dimînin. Piştî ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê, di 18’ê Adara 2018’an Efrîn dagir kirin, bi hezara şêniyên Efrînê neçar man ber bi kantona Şehbayê ve herin. Şênî li gund û navçeyên kantonê belav bûn. Zêdetirî 22 hezar ji şêniyên Efrînê li navçeya Til Rifatê bi cih bûn.

JI BER VALABÛNA WÊ JI XWE RE KIRIN KAMP

Navçe jî wek gelek bajarên Sûriyê di aloziya heyî re derbas bûye. Di encama şerên navbera komên çekdar, bi taybet şerên di navbera komên çekdar û rêjîma Sûriyê de ku di van salên dawî de rûdane, wêran bûye. Piraniya mal û binesaziya navçeyê ruxiyaye. ji ber wan şeran û mayînên ku komên çekdar ên navçe kiribûn bi serweriya xwe, bi hezaran şêniyên Til Rifatê berê xwe dan kampên Tirkiyê. Navçe vala bû.

ŞÊNÎ HEYA VEGERA EFRÎNÊ XWE BIRÊXISTIN DIKIN

Şêniyên Efrînê û Şehbayê xwe li Til Rifatê birêxistin kirin û xwe bi xwe karên xwe birêvebirin. Di navçeyê de meclis û 15 komîn hatin avakirin.

Her wiha şêniyan Şaredariya Gel li navçeyê ava kirin. Li gel tunebûna rêxistinên pisporê rakirina bermahî û mayînan, Şaredariyê hewl da malên ku hema bêje wêran bûne paqij bike, bermahî rake, pêdiviyên malan ji pencere, derî, xezanên avê û jeneretor peyda bike. Tevî van xebatan jî hindek mal û zevî hîna mayîn lê hene. Di encama teqîna wan mayînan de heta niha 2 sivîlan jiyana xwe ji dest dan û gelek din jî birîndar bûn, piraniya wan zarok bûn.

Heyva Sor a Kurd li rex komîteyên xêrxwestinê Buroya Mirovahî vekirin da ku alîkariyên tenduristî û alîkariyên din pêşkêşî şêniyan bikin.

Meclisa navçeyê berê, mehê du caran alîkarî li şêniyan belav dikir, lê ji ber paşguhkirina rêxistinên mirovî pêşkêşkirina alîkariyan niha tenê mehê carekê çêdibe.

REWŞA HEYÎ

Navçeya Til Rifat dikeve navbera bajarên Meri û Ezaz de û 18 km ji sînorên Tirkiyê dûr e. Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li deverên ku bicih bûne li nêzî navçeyê dewriyên xwe zêde kirine, di hewldanekê de ji bo êrîşkirina navçeyê.

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê dem dem navçeyê topbaran dikin. Herî dawî şeva 12`ê Nîsanê, çeteyan derdora navçeyê bi armanca tirsandina şêniyan û koçberkirina wan topbaran kirin. Di encama topbaranan de du sivîl yek jê zarok birîndar bûn.

Piştî bicihbûna şêniyên Efrîn û Şehbayê li navçeyê, navçe qerebeliq bûye û gelek dikan tê de hatine vekirin. Hindek nîştecihên navçeyê dibînin ku navçe ewle ye û pêdivî lê peyda dibin.

Lê hindek şêniyên ku gelek caran koçber bûne, ditirsin ku carek din koçber bibin. Nûçegihanê ANHA' yê di nav navçeya Til Rifatê de geriya û nêrînên şêniyan girtin. Piraniya pirsên şêniyan dibêjin gelo dibe ku carek din koçber bibin û dê bi ku derê ve biçin? Ji aliyekî din ve hindek şêniyan hêviya xwe bi berdewamkirina jiyanê li herêmê û domandina ewlehiyê rave kirin.

Hevserokê Meclisa navçeya Til Rifatê Mihemed Henan teqez kir ku ew hewl didin pêdiviyên şêniyan li gel şert û mercên dijwar ên dorpêçê û paşguhkirina rêxistinan peyda bikin.

Rûsya nuqteyên xwe yên li Til Rifatê radestî hêzên rêjîma Sûriyê kirin û çekên giran sivik kirin. Lê hêzên Rûsyayê li navendên xwe yên sereke li Til Rifatê û gundên derdorê hene û dewriyan bi awayekî domdar dimeşînê.

Di çarçoveya belavbûna gotegotên girêdayî vekişîna Rûsya ji herêmê metirsiyên şêniyan bi dubarekirina senaryoya dagirkirina Efrînê, hene. Artêşa Tirk a dagirker piştî vekişîna hêzên Rûsyayê ji Efrînê di 20`ê Çileya 2018`an dest bi êrîşî Efrînê kir û Efrîn di 18`ê Adara 2018`an de dagir kir. Şênî beriya vê di 18`ê Adara 2019`an de nameyek radestî hêzên Rûsyayê kirin. Di nameyê de şêniyan bang li Rûsyayê kirin ku desteka Tirkiyê rawestîne û Tirkiyê ji Efrînê derxîne.....***ANHA***

Rûsya ne cihê baweriyê ye

Zekî BEDRAN

Rûsya dixwaze çi bike? Ewqes hevdîtinên Erdogan bi Rûsya yê re ne nîşaneya xêrê ye. Bawerî bi nêzîkatiyên Rûsya yê menfatçî û oportonîst ve nayê anîn. Tu vekirîbûnek û demokrasiyeke ku bi rêk û pêk di rastiya Rûsya yê de tuneye. Di dilxwe de digot ewê Tirkiye alîkariya xwe ya ji çeteyan re di Idlibê de rawestanda, Rûsya û rêjîm jî ewê sozên xwe yê ji Tirkiye re daye pêkbanîba. Lê Erdogan bi Putîn re hevdîtinan pêk tîne û her pirsgirêkê talok dike.

Rûsya, berê Tirkî dida rojhilatê Firatê. Tirkiye dijminê kurda ye. Tevayî barzarên wê û tawîzên wê di ser kurda re ye. Rûsya jî ev yek ji bo berjewendiyê xwe bi kar di anî. Niha jî dîtin bê Tirkiye çiqase bi xetere. Di vê mijarê de ne ku bê agahî bûn ji rastiya Tirkiye yê. Lê Rûsya meseleya Sûrî û yekîtiya axa wê weke meseleke xwe ya sereke nabîne. Efrîn jî axa Sûrî bû, lê Rûsya ew ji Tirkiye re pêşkêş kir. Bab û Cerablus jî axa Sûrî ye. Tirkiye çawa ku hîn ji van deran derneketiye, ji bo ku herêmên nu jî dagir bike bi Rûsan re hevdîtin û bazariyan dike. Hukumeta Sûrye yê jî çi difikire ji bo Rûsya yê ewqes ne giringe. Jiber ku rêjîm zayif ketiye û ruxmî Rûsya yê nikare bibe xwedî helwest û siyasetê diyar bike.

Hêzên Sûrî beşeke giring ji axên xwe yê rojhilat û bakur di destê xwe de digre. Herêmên xwe ji DAIŞ’ê paqij kirin. Rêveberiyên Demokratîk ava kirin. Tevayî gel, ol û çand qabiliyetên xwe yê li gel hav jiyankirinê dan nîşandan. Ev ji bo Rojhilata Navîn firset û mînakeke pir başe. Ger rêjîm bi vana re li hev bike û aşîtiyê pêk bîne, ewê bikaribe hevgirtina beşeke mezin ji axa Sûrî jî biparêze. Tenê Idlib û herêmên ku di bin dagirkeriya Tirkiye yê de ne, dimîne. Lê dema ku civakeke Sûrî ya yekkirî be, ewê ji bo derxistina dagirkerên biyanî jî zehemtiyan nekêşe. Wê hêzeke wiha derkeve holê. Li şûna ku Rûsya ji bo vê yekê bixebite, bibe navberkarî ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê, bi Erdoganê ku qirîzê kûr dike û hewild dide ku şer têxe bakurê Sûriye yê re dikeve nava bazariyen bi dizî de.

Tevayî çavdêr şîrove dikin ku Tirkiye hewil dide êrîşî bakurê Sûrî bike, Rûsya yê jî ji bo vê yekê îqna bike û destekê jê bigre. Ji xwe Tirkiye pêwîstî nabîne ku niyeta xwe ya êrîşkirinê veşêre. Ji bilî vê ji xwe hewil dide ku DYE jî îqna bike û ji bo dagirkirinê astengiyan ji holê rabike. Li beramberî hewildayînên Tirkiye yê dagirkirinê Rûsya hîn helwestek zelal ne girtiye û tu daxuyanî jî nedaye. Bi qasî ku bikaribe hewil dide ku tawîzan ji tirkiye bigre û li gorî berjewendiyên xwe jê fayde bibîne. Pir vekiriye ku ev helwesta Rûsya yê bawerî nade.

Rûsya ji rêveberiyên bakurê Sûrî neqşe rê xwest. Ewê di dil xwe de bi rêveberiyên Esed re hevdîtinan bikra û navberkarî ji bo çareseriyê bikra. Lê di hevdîtinan de tu pêşketin ne da xuya kirin. Berovajî vê bi Tirkiye re her ku diçe hevdîtinên wê zêdetir dibe. Qalbikî pêşniyariyên çareseriyê yê bakurê Sûrî pir maqulaneye. Sûriyeke demokratîk dihate xwestin. Rûsya bi xwe jî federasyone. Herêmên yan jî rêveberiyên xweser Sûrî parçe nake berovajî dike yek û bi hêz dike. Piştî DAIŞ’ê hîn zêdetir lez da pêvajoya siyasî. Rûsya li şûna ku vê pêvajoyê binirxîne û bala xwe hîn zêdetir bide ser çareseriyê, weke ku qet haya xwe ji pêvajoyê û derfetên heyî nîne tevdigere. Li şûna vê bi Erdogan re hewil dide ku hin tiştan bi mixmixîne. Erdogan jî cihên ku dagir kiriye weke ku axên Tirkiye ye bi rêve dibe û bi rêxistin dike. Tevayî çeteyan li derdora xwe kom dike û ji bo her keseke bûyîna çavkaniya xeteriyê didomîne. Ji bo dana sekinandina Tirkiye yê û dûrxistina wê ji Sûriye yê, pêwîst dikir ku herî zêde Rûsya xwediyê vê hewildanê ba. Li gorî prensîba Rûsya yê pêwîst dikir ku bi vî rengî tevbigeriya ya.

Zehmetiyên Rûsya yê heye, ev nayê înkar kirin. Welatên Ewrûpayê mijûl dibin ku Îran û Rûsya yê zayif bixin û Sûriye yê ji wan re nehêlin. Ermancên wan yê ku dawî li rêveberiya Esed jî bînin heye. Tirkiye jî ne ji derveyî vê pîlansaziyê ye. Bi qasî ku Rûsya li dijî vê pîlanê ye pêwîst dikir ku Tirkiye ji derveyî Sûriye yê bigirta, lê ew li gorî vê yekê jî nêzîk nabe. Di encam de ewê teqez zerareke pir mezin him bighêje Sûriye yê him jî bighêje Rûsya yê.

Gelên Sûrye yê û hêzên wê yê demokratîk li beramberî van leyistokan û bazariyan mecbûre ku hişyar û bi hev re be. Yekîtiya gelan tenê dikare van hewildayînên dagirkeriyê û êrîşên wê bide sekinandin. Heya ku gel ranebin ser piyan, bi rêxistin nebin û berxwe nedin, ewê dawî li leyistok û îtîfaqên veşartî jî neyê. Di rewşa heyî de li şûna aşîtî û demokrasiyê dagirkerî û leyistokên nû yê şer têne pîlan kirin. Ji bo li beramberî van leyistokan were sekinandin gelên Sûriye yê mecbûre ku bi amedekarî bin.

FENER

Berxwedana efrînê cewherê şoreşê ye

Idrîs HENAN

Zêdeyî salekê ye gelê Efrînê di nav çadirên derbiderbûnê û kavilên bermahiyên çeteyan li Şehbayê li ber xwe dide. Zêdeyî salekê ye û gelê Efrînê bê navber li hemberî dagirkeriyê li ser piyan e. Bi çalakî û sekna xwe ya sade rê li ber plangeriyên tên rêsandin girtiye û li hemberî niyetên neyar û dagirkeran fena striyekê di nîva rê de veçikandiye. Çawa ku gelê Efrînê di yekemîn qonaxa Berxwedana Serdemê de bi îradeya xwe ya serbixwe li ber xwe da, îro jî di qonaxa duyemîn a Berxwedana Serdemê de bi heman vînê li ber xwe dide. Ne gotinên înşa û nivîsandina mijarekê ne, ancax mirov bi çavên xwe bibîne ta ku hîs bike. Bi qasî berxwedaniya gelê Efrînê faşizm û welatên komploger di nava hewldanên têkbirin û ji nav birina vê vînê de ne. Perelelî van hewldanan û di çarçoveya heman komploya navneteweyî de, di şexsê Efrînê de hemû nirxên kurdan bin pê dikin. Armanca wan jî ew e; vîna ku bi sekna Efrînîyan li Şehbayê xwe daye der bişikînin û enerjiya rizgariyê rawestînin. Têkoşîna gelê Kurd wan ditirsîne û dekdolabên wan jî ji nav dibe. Ji ber vê jî bi şev û roj, bê navber êrişên xwe ranawestînin.

Pêwîste mirov li berxwedana Efrînê tenê bi qasî ku têkoşînek ji bo rizgarkirina Efrînê nenihêre. Çawa ku dagirkeriya faşîzma Tirk dagirkirina Efrînê weke kilîta pêkanîna xeyalên xwe yên misaqa millî bi nav kir, her wiha berxwedana ku niha di şexsê Efrînê de têye birêvebirin têkbirina van xeyalên osmancîtiya nûjen e. Di heman demê de ev berxwedan li hemberî plangeriyên hêzên hegemon ên mîna Rûsya û Amerîka û pêşbirka hêzê û serweriyê ya hêzên herêmî û navdewletî, mîna sûrekî bilind û asteng bûye. Ji ber vê xisûs û taybetmendiya duyemîn qonaxa Berxwedana Serdemê asta êriş û plangeriyan jî zêde bûye. Ya herî ber bi çav jî ku hîna li Efrînê dest pê kiribû, têkiliya diru ya dewleta Rûsa bi contaya Tirk re ye. Jixwe li ser esasê lihevkirin û peymanên eşkere yên Astana û Sûtişiyê dagirkerî pêk hat. Bê guman rizamendiyek navdewletî li paş vê itîfaqa dualî jî hebû. Helwestên ku di pêvajoya yekemîn qonaxa Berxwedana Serdemê de derketine, vê têgihaştina me piştrast dike. Tabî tişta ku em dibêjin beşek rastiyê ye. Rastî hemû jî girêdayî berxwedana topiyakûn û têkoşîna mafdar a gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê ye. Eger bi çavekî neteweyî û welatparêz li berxwedan efrîniyan neyê nihêrandin, mirov nikare mane bide têkoşîna li beşên dîtir ên Kurdistanê. Ne jî dikare aliyê civakî de hişmendî û eqlekî giştî ava bike. Bi nêzîkatiyên seranser wê civak di çarçoveya restorekirina çalekê û qirkirina riyekê de xetimandî bimîne. Ango li şûna avakirina têgihaştineke welatperwer wê civak kembera xwe ya parastina ideolojîk ji dest bide û wê rûbirûyî neoliberalîzmeke feudal bi tena xwe bimîne. Ev jî tê wê maneyê ku; civak bi xwe vîna xwe radest bike. Ji bo rêgirtina li ber vê keraseta hişmendî, erka sereke li ser pişta ronakbîr, rewşenbîr, rojnamevan û birêvebirên civakê ye. Eger ew jî di nava vê xefkê de fetisî bin, tekez wê bi vê helwest û sekna xwe ya dûrî welatparêziyê bibin bingeha jî nav birina hemû destkeftiyan. Ji ber vê jî xwediderkerina li berxwedana Efrînê erkekî welatparêzî û dozeke navendî ya neteweyî ye. Têgihaştina cewherê berxwedana Efrînê, têgihaştina rastiya şoreşa Rojava ye.